

FAQ Coronaschutzverordnung - gültig bis vorerst 30. September

Qaydeyên Parastina ji koronavayrûsê dê heta 30yê îlonê bi awayê demkî di rewacê de bimînin.

Qaydeyên Parastina ji Koronavayrûsê dê heta kingê dewam bikin?

Zemanê verastkirina li ser Qaydeyên Parastina ji Koronavayrûsê hatiye dirêjkirin. Bi kêmayî dê heta tarîxa 30yê Îlona 2020î di rewacê de be.

Lihevanînen herêmî yên li dijî belavbûna şofê dê kingê bivên?

Birêvebirîya eyaletê bi tevdîrên taybet ên ji bo herêmî têkoşînen xwe yên ji bo rawestandîne dewam dike. Bi awayê ku 100.000 kesan (bûyerên 7 rojî) bixe nav xwe, tevdîreke rawestandîna koronavayrûsê ya di heft rojên paşîn de bi 35 bûyerên nû tê destpêkirin. Piştî ku ji vî dîwarê hat buhurîn, dezgehên bajarvanîyê yên xuyandî, Landeszentrum Gesundheit û birêvebirîyên xuyandî yên qezayan demildest dê ji bo sitandîna tevdîrên pêvekî yên ji bo rawestandîna belavbûna vayrûsê tevbigerin. Gava ku bûyerên 7 rojî ji 50yî buhurîn divên tevdîrên pêvekî yên ewlehîyê bilez bèn pêkanîn. Di gavên weha de divê Wezîrîya Kedê, Sîhetê û Karên Civatî jî bê tevlîkirinê proseya biryarê.

Dê ji bo qûnaxvegirtinê çi bihevexistin di rewacê de bin?

Ji ber ku vayrûs bêtir dibe û belav dibe eger mêvanên ji herêmeke ku bi qaydeyên taybet û yên herêmî yên bi koronavayrûsê ve têkildar in hebin ev kes dê karibin bi tenê otêl, xan û pansiyon û yên wek wan ên qaydeyên wan ên taybet hene bi kar bînin. Wek nimûne, diê testên mêvanan ên koronavayrûsê neyînî/negatîv bin. Ev test, divê bi awayê ku ji berî gava gihîştinê bêtirî 48 saetan nînbe pêk hatibe (tarîxa eşkerebûna encaman wek a destpêkê tê qebûlkirin). Têbînî: Sebebên geştê yên din ên maqûl û yên bi mebesta bazirganîyê bivênevê bin (serdana xizman û hevjînan filan) ne di nav van bihevexistinên vegirtina qûnaxê de ne.

Gelo dê pêdivêya maskeyê bê dirêjkirin?

Erê, dê ji bo niha heta 30yê îlona 2020î bê dirêjkirin.

Pêdivêya maskeyan li ku deran di rewacê de ye?

Maskeyê ku dev û kepîyê bigire di hemû dezgehên bazirganîyê, kulturî û yên bi mebesta kêfê de; li cîhên çûn û hatina mişterîyan û gelî, di veguhestina tevahî de û yên wek başkirina sihetê de divê bê bikaranîn. Têbînî: Yên ku pêdivêya maskeyê pêk neyînin dê nikaribin bikevin avahîyên xuyandî û xizmetên têkildar bistînin, qedexe ye.

Gelo di bivênevîbûna maskeyê de îstîsna hene?

Erê, bivênevêbûna maskeyê ji bo zarokên hê nehatina asta xwandinê ne di rewacê de ye. Kesên ku ji ber sebebên sihetê nikarin maskeyê dev û bêvlê bigire li xwe bikin, ji pêdivêya maskeyê serbest in. Sebebên tîbbî divên bi raporteke nujdarîyê/diktorîyê ya li ser daxwazê pêşkêşkirî bên îsbatkirin. Ji bilî van, yê sebebên wan ên taybet ên wek teşqeleyên wan ên bihîstinê hene yan bi kesên qerr re têkilîya wan hene jî bi awayê demkî dikarin maskeyên xwe der bixin.

Gelo dê cezayên ji bînpêkirîyên maskeyan re dayî bên bêtirkin?

Erê, di veguhestina komî de li bînpêkirîyên maskeyê 150 Euro ceza tê birîn. Ji yê di rewşên din de bînpê dikin re 50 Euro ceza tê birîn.

Maneya bihevexistinê qedexeyîyên bi pêvebûnê ve têkildar çî ye?

Li cîhên gelî tê karîn wek kom bi awayê ku ji deh kesan nebhure were kombûn. Ev jimara herî pirr ji bo kesên ji du malbatên cuda hatî jî yan yê yekser xizmên hev in ne di rewacê de ye. Di deverên xuyayî de berpirsîyarîya lixwekirina maskeyê dev û pozî digire û pêdivêya 1,5 mîtroyî ya navbera tevahî hê jî di rewacê de ye.

Gelo di bijartinê dezgehên bajarvanîyê (belediyeyan) de li jorên bikaranîna rayan pêdivêya navberê dê hê jî di rewacê de be?

Erê, di pêdivêya navbera 1,5 mîtroyî û pêdivêya lixwekirina maskeyên devî û kepîyê digirin di jorên/odeyên bikaranîna rayan de û rêzbûnên derveyê wan de di rewacê de ye. Bi tenê alîkarên rayavêtinê, eger karibin bi hemû kesên din re di navbera xwe de navbera herî kê m biparêzin, li nivîsingeha bikaranîna rayan dikarin parêzkara devî o pozî bi kar neynin.

Ji bo kesên kê mendam pirsek: Gava tevlibûyîna kombûnan û komên din ên mirovan gelo alîkarên wan yan xwedîkerên wan dikarin hevaltîya wan bikin?

Erê. Eger we alîkarî bivê di çarçoveya kesên destûrdayî yan jimara yê navmalî de dibe alîkarek hebe.

Karîna bidûketina asa û taybet çawa bin av dibe:

Eger enfeksîyona koronavayrûsê hebe divê zanyarîyên kesên ku nexweş bi wan re têkilî kiriye bi meqamên sihetê bên daznanîn. Divên mazûvan, xwedîyên malan, birêvebirên avahîyan, xwedîyên şîrketan filan bi sitandina destûra serdêran navê, navnîşana, jimara tîlefona û (eger hebe) zemanê mayîna wan qeyd bikin û çar hefteyan veşêrin. Ev dane divên li hember gihana bêdestûr bên parastin û piştî çar hefteyan bi temamî bên tunekirin. Mebesta bi "bidûketina asa" ev e.

Lê di “bidûketina taybet” de, digel hemû daneyên li jorê, cedwela cîhê rûniştina kesî jî heye. Sazkirina cedweleke weha ya rûniştinê mecbûrî nîne. Lê eger cedwela rûniştinê bê sazkirin, di hin çalakîyên xuyandî de dibe guh neyê dayîn navbera herî kêma a nava kursîyan. Eger ev bijare bi kar bê, divê cedwela rûniştinê jî çar hefte bê veşartin.

Bihevixistinên ji bo çalakîyan û kombûnan di rewacê de ne çi ne?

Çalakî û kombûnên gihîştîne 300 tevlibûyîyan, bi tenê eger ji bo paqijîyê, gihana bi kontrol û (tevlî ketina dorê) ji bo navbera 1,5 mîtroyî ya herî kêma hemû tevdîrên lihevhatî hatibin sitandin dibe pêk bê. Ji bilî cîhên devre, divê bidûketina asa bê pêkanîn. Eger tevlibûyî gava çalakîyê li cîhên xwe yê xuyandî rûniştî bin (bi saya dabînkirina bidûketina taybet) navê pêdivêya herî kêma a navberê pêk bê. Pêdivêya maskeyan li cîhê hundirî, eger yek li cîhê xwe nîbe di rewacê de ye.

Çalakîyên li wan bêtirî 300 tevlibûyî hebin, divê rewşa wan a paqijîya taybet û parastina ji şofê hebin.

Heta tarîxa 31ê çileyê pêşîn ê 2020î, wek pêşandan, zêw, pêşandanên bajar/ gundan/kuçeyan, pêşbirkên avêtinê, zêwên araqê filan şahîyên berfireh dê qedexa bimînin.

Ji bo çalakîyên civatî yê wek dawetan çi bihevixistin di rewacê de ne?

Sînorê 150 kesî hê jî di rewacê de ye. Ji ber sebebên ewlehîyê hemû karkir (barmen filan) divên li hundirî û li derve maske li xwe bikin.

Gelo dê ji bo çalakîyên 500+ kesî çi bihevixistin di rewacê de bin?

Di çalakîyên heta 500 tevlibûyîyan de tevli konseptê paqijîyê ya heta vêga mecbûrî bû, ev konsept, divê pêkanîna tevdîrên bi awayê maqûl çûn û hatinê bide xuyandin. Wek nimûne, wekî ku bi sebebê jimara rêwîyên bêtir nikare bar bê ser veguhestina komî.

Gelo dê ji bo çalakîyên 1000+ kesî çi bihevixistin di rewacê de bin?

Bêtirî 1000 kesî bi tenê eger cîhê çalakîyê ji sêyeka kapasîteya asa nebhure tije bibe dikarin bîna cem hev. Yanî 1000 kes bi tenê li cîhên bi kêmayî ji bo 3000 kesan pîlankirî ne dikarin bîna kêleka hev. Ev qayde ji bo jimarên bêtir jî bi heman astê di rewacê de ye. Ji bo çalakîyên sîporê sînorê 300 temaşegeran hê jî di rewacê de ye. Ji bilî van, eger ji diwarê 1000 kesî bê buhurîn, bihevixistineke nû ya di seranserê eyaletê de ya di heman demê de vîyana erêkirina wezîrîya sihetê jî dide xuyandin di rewacê de ye ya ku divê pêşîn ji bo çalakîyê erêkirina ji meqamên dezgeha bajarvanîyê û birêvebirîya eyaletê bê sitandin di rewacê de ye. Ji ber ku çalakîyên weha berfireh bi piranî ne bi tenê ew çalakî ne ku bi gelê herêmî ve têkildar bin. Dê meqamên dezgeha bajarvanîyê van babetan bi wezîrîya sihetê re bi rê ve bibin.

Gelo ji bo çalakîyên kulturî bihevaxistinên taybet hene?

Ji bo çalakîyên din jî bihevaxistinên wek wan hene: tevdirên taybet ên paqijiyê, gihana bi kontrol, navbera herî kêma hîmî, hewadana mayînê û têra rewşê, pêkanîna bidûketine asa û (eger hebe) divê pêdivêya maskeyê pêk bê. Ji jimara 300 temaşegeran pê de ji bo çalakîyê bi tenê eger konseptaya taybet a paqijiyê û astengkirina enfeksiyonê pêk bê, dikare destûr jê re bê dayîn.

Ji bo koman û sîporên kêfê bihevaxistinên di rewacê de ne çi ne?

Di dezgehên gelî û yê taybet ên sîporê de yan li cîhê gelî tevlibûyîna sîporê û hînkariyê di çarçoveya hin qaydeyan de mumkin e. Ev; qaydeyên paqijiyê, gihana bi kontroyê, pêkanîna navbera herî kêma 1,5 mîtroiyê, tevli cîhên xweşûştinê, cîhên şuştinê û guherandina cilan, tevdirên jê re erêkirî dixin nav xwe. Di sîporên hundirî de divê hewadayîn bi awayekî baş pêk bê.

Ji bo sîporên pêvebûnê çi bihevaxistin di rewacê de ne?

Tevli hemû leyistikvanên ji wan re ji alî qanûnên demkî yê yekîtîyê yan fermana qanûnî ya leyistikê ve destur hatiye dayîn, komên heta 30 kesên yan du tîman dikarin sîporên pêvebûnê bileyîzin. Divê keysa çavdêriya asa bê pêkanîn. Zêwên sîporê û çalakîyên wek wan ên sîporê bi kêmayî heta 31ê çileyê pêşîn ê 2020î qedexe ye.

Gelo ji bo hînkirina laşî çi bihevaxistin di rewacê de ne?

Ji bo hînkirina laşî destûra sîporên bihevaxistinê jî tê dayîn. Destûra dersên soberîyê/avjenîyê/melevanîyê jî tê dayîn.

Gelo di kîjan rewşan de destûra pêşbazîyên atletîk tê dayîn?

Erê; bi şertê ku tevdirên paqijî, rêlibergirtina şofê, gihana bi kontrol û parastina navbera herî kêma 1,5 mîtroiyê bîna parastinê, dê ji sîporên komî û bi mbesta kêfê re û (ji bilî sîporên profesyonel) ji pêşbazîyên sîporê yê elît re destûr tê dayîn. Ji bilî sîporên profesyonel, bi şertê ku qaydeyên xuyandî hebin; tevli siwarbûna li hespê, pêşbazîyên hespan jî, bihevaxistinên taybet ên desthilatê didin lîgên profesyonel di rewacê de ne.

Di lîgên herêmî yan pêşbazîyan de dê destûra çend temaşegeran bê dayîn ew temaşe bikin?

Ji 16ê îlonê û pê de bi şertê pêşkêşkirina konseptaya parastina ji enfeksiyonê û paqijîyeke taybet, dê bêtirî 300 temaşegeran dîsa karibin tevli lîgên herêmî yan leyistikên pêşbazîyan bibin. Ji bo bêtirî 1000 temaşegeran -her wekî çalakîyên din- dê sînoreke jorî ya sêyeka kapasîteya avahîya sîporê bê pêkanîn.

Dê di pêşbazîyên sîporê yê seranserê welêt de bihevxiştina temaşegeran çawa be?

Eyaletên federal, tevî maçên Bûndeslîgayê di seranserê welêt de li ser çalakîyên sîporê di 15ê îlonê de li ser bihevxiştineke hevpar li hev kirine. Jimara temaşegerên destûrdayî dê ji bo her cîhekî bi awayê cûda bê xuyandin. Di gava xebateke tecrîbekirinê ya şeşhefteyî de kapasîteya herî pirr a destûrdayî, li ser bêtirî 1000 temaşegeran, ji sedî 20ê kapasîteya salonê yan stadyûmê ye. Di ketin û derketinê de bi wekhevîkirina jimara serdêran û qedexekirina xizmeta araqê û vexwarina wê, divê vîyana navbera 1,5 mîtroyî jî bê dabînkirin. Heta rûniştinê yan rabûnê lixwekirina maskeyê ku devî û bêvlê digire divê. Hemû kursîyên temaşegeran bi awayê mayînî xuyandî ne. Dê bilêtên temaşegerên mêvan neyên dayîn. Li cîhê çalaki lê pêk tê eger serê 100.000 kesî însîdansa 7 rojî 35 yan bêtir be û asta enfeksiyonê bi awayekî eşkere neye sînorkirin, dê hîç temaşegerê jî çalakîyan re neye qebûlîkirin.

Gelo dê SPA, avgerm û hewzên soberîyê dîsa karibin vebin?

Erê; dê destûra dîsa vebûna avahîyên zindîmayînê, parken avê û hewzên soberîyê bê dayîn. Dê avgerm û avahîyên wek wan dîsa karibin vebin. Ev xizmetên zindîmayînê dê ji bilî van li avahîyên bêhnvedanê jî dîsa karibin bîn bikaranîn. Divê pêkhatinên parastina ji enfeksiyonê û paqijîyê yê têkildar bîn pêkanîn.

Gelo ji bo bazirganîyê çî cûrên biryarên hêsankirinê hatine dayîn?

Ji tarîxa 15ê hezîranê pê de di çavdêriya jimara gihana li ser cîhên bazirganîyê de hin pêkanînên hêsankirinê hatine destpêkirin. Li gora cîhê firoşkarîyê yê firoşgeha têkildar, di her deh mîtroyên çargoşeyî de; di şûna kesekî de, bi awayê ku di her heft mîtroyên çargoşeyî de kesek hebe, dê qayde bê sivikkirin.

Gelo dê ev awa ji bo muzeyan, pêşangehan û baxçeyên gîyaneweran jî di rewacê de be?

Erê, di şûna ji her heft mîtroyên çargoşeyî re kesek de bi awayê ji her deh mîtroyên çargoşeyî kesek be, dê sînorê serdêran bê firehkirin.

Gelo bar dîsa dibin vebin?

Erê, destûr heye ku bar bi hin mercan bîn vekirin.

Ji bo klaban, klabên şevê û kerxaneyan çî biryar hatine dayîn?

Klab, klabên şevê û avahîyên wek wan dê girtî bimînin. Bi tenê li gora standardên parastina ji enfeksiyonê û hijyenê yê di Pêveka Fermana Qanûnî ya Parastina ji Koronayê de xuyandî

destûra karkirina avahî û navgînên kerxaneyan tê dayîn. Li gora Qanûnê Parastina Jinên Kêfkirinê, madeyê 2yê, paragrafa 6an, destûra çalakîyên fihûşê nayê dayîn.

Gelo ji bo xizmetên xurekîyê çi bihevexistin di rewacê de ne?

Herî pir deh kes yan yê yekser xizm in yan ji du famîleyan dikarin li ser yek maseyê rûnin. Ji bo paqijî, kontrola gihanê, parastina navbera herî kê 1,5 mîtroyî û bidûketinê tevdîrên lihevhatî divên bên sitandin; hûrgilîyên li ser vê yekê di standardên xuyandî yê paqijîyê û parastina ji enfeksiyonê de hene. Ji tarîxa 15ê temûzê ve avahîyên xizmeta xurekîyê dê karibin şahîyên heta 150 kesan li dar bixin (wek nimûne dawet, rojên Xwedêdanê filan).

Gelo ji bo barên nargîleyê çi bihevexistin di rewacê de ne?

Nargîle divên ji alî çendîn kesan ve neyên bikarhatin, dibin bi tenê bi perçeyên devî yê karibin bên avêtin û perçeyên xortoman re bên bikarhatin û li cîh divê bi temamî û bi awayê mayînê bê hewadarkirin.

Gelo êdî destûr heye yek manqelê çê bike?

Erê, li cîh û avahîyên gelî êdî destûra çêkirina manqelê heye. Divê kêmkirinên pêvebûnê pêk bînin (bi tenê komên heta 10 kesan, xizmên nêz, mirovên ji du malên cuda hatî).